

Hewla qirkirina çandî
ya Kurdên Qezwînê ji
aliyê rejîma Tehranê ve!

»»» R:7



Çima şoreşa
1979ê di Îranê de
çêbû

»»» R:3



Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (391) 04-02-2021 Buha (1000) Tûmen


Şerê nerim û çew-
tekariyên rejîma
Îranê li dijî Kurd

»»» R:4



Şerê medyayî û
psîkolojîkî yê rejîmê
li hember gelê Kurd

»»» R:6



Şerê psîkolojîk a şikestxwarî

Komara Îslamî herdem raştî
krîz û arîşeyên mezin dibe ku
şiyana çereserkirina wê namîne,
berteke tund ji xwe nîşand dide
daku bi vî awayî daxa pir ji kerba
xwe aram bike û hesta bêdesthilatî
û tirsê xwe vebîşere.

Bo mînak dema ku di şerê 8
sale de raştî şikestê hat, û hate
neçarkirin ku cama jehrê ve-
bixwe, deşt avêt bi du pirojeyên
wekî hev: Yekem îdamkirina zê-
detir ji 7 hezar girtiyên siyasî li
heyama 3 mehan de û a duhem,
qetlên siyasî di navxwe de ku
bi qetlên zencîrî tê binavkirin ku
armanca wan jinavbirina rêberên
siyasî yên dijberê Komara Îslamî
bûn. Yan demkê di pirojeyê
siyasî de serkevtî nebe û ber bi
aliyê xelkê ve diçe û deşt diavêje
bi girtina bi kom û tundûtîjîyê
zêde di navxwe de: Her wek vê
me di sala 1384 û 88an a Rojî de
dît.

Em dikarin di nûtirîn haletên
hevşewê de basa du mehên der-
basbûyî wek mînak bînin, di vê
heyamê de û tenê li Kurdiştanê
pêlêke nû, lê berbelavtir ji der-
basbûyî ji binçavkirina welatîyan
deşt pê kiriye ku rêjeya wan ji
100 kesê ye. Ev kesane beşeke
zêde xelkê asayî, çalakvanên
jîngehparêzî, kedkar, medenî û
jin bûne.

Hevdem digel girtina bi kom,
komek êrişên sistematîk bi
nav deng û rengê rejîmê û kar-
bideştên wê li çend bajarên
Kurdiştanê de kirine ser kincên
Kurdî û herwisa kesayetiyên
çandî û edebî û siyasetî. Lê wê
carê bo çî?
Komara Îslamî di dawî hilbijar-



tina xola meclisa xwe de raştî krîza kûr a rewayî
hatibû, herwisa bi sedema birêveberiya netendi-
ruştî û hebûna hin mafiyayên cor bi cor ên aborî,
li hemûyan sertir Spaha Pasdaran a terorîst, raştî
herifîna aborî hatiye û hilbijartina Serkomar jî li
pêş de ye! Liberçavgirtina wê raştîyê ku Kurd-
îstan îro her wek derbasbûyî, navenda sereke
a tevgera mafxwazane ya dij bi koloniyalîzma
Komara Îslamî ye, eşkere ye ji aliyekê ve hewla
çavtirsandin, mîlîtarîzekirin û çewtekarî bi mer-
ema veşartina krîzan û ji aliyek din ve jî hewla
rakêşana xelkê bo ser sendoqên dengdanê bide.

Komar Îslamî bilî vê ku ji wan bêrêziyên bi
kultûra Kurd kiriye û bilî girtina bi kom a ci-
wanên Kurd, ji aliyek di ve jî hewil daye tevgera
Kurd li Kurdiştana Îranê û herwisa serweriyên
Kurd li parçeyên din ên wê nîştimanê xîçdar bike.

Ev jî pêkhatibû ji çêkirina hin rêzefilmên pêkenîn
yên bi navên “Rozhayê Ebedî” û bi nav belge-
filmek a bi navê “Lebê Duwimê Tîx” û kurte-
filmek betal ji wate û aliyên hunerî û zaniştî a
bi navê “Tewekol” ku ji wan her sê berhemên

televîzîyonî de bêrêzî
bi xwîna şehîdên
pêşmerge li Başûr û
Rojhilatê û kesên xuya
yên tevgera Kurd û
Pêşmerge Kurdiştanê
kiriye.

Eva ku rohn e haşa lê
nayê kirin ew raştîye
ye ku rejîma kevneper-
estî û dijekurd a Ko-
mara Îslamî her ji roja
yekem a hatina serkar
ve, êriş kiriye li ser her
awa daxwaz û dengeke
maf xwazane û bi zêde
ve jî li hember dax-
awaza rewya ya gelê
Kurd sekînanîye û bi
bêrehmî ve rûbirûyê
şoreşvanan û dadper-
wer û nîştimaniyan
bûye.

Şerê nerim ê Komara
Îslamî ya vê carê li
hember gelê Kurd
şereke nerim a zibir û
dijwar e, lê bi derdan û
dûrawî deşt pê kiriye!
Rejîma dijekurd a
Îranê salanê sal e di
vê raştayê de pêngav
hilgirtîye û kêmanînin
ev bi nav berhemên
sînemayî ku girûpên
taybet û yên diyarîkirî
yên ser bi Wezaretê
Îtilatê çê kirine,
daku ji aliyekê ve
xelkên xeyrekurd raştî
tirseke çêkirî beran-
ber bi Kurd bikin ji
aliyek din ve jî nîşî
nû a Kurdiştanê ku
şarezayî û ezmûneke
wisa li ser derbasbûya

pir ji şanaziya gelê xwe nînin û
nizanin ku Tehran çî cinayetek li
Kurdiştanê de afirandîye, bix-
elitîne.

Armançek din a rejîmê ji vê
karê eva ye ku hewlekê bide
bo mewdaxîstîna di nav xelkê
Kurd û partiyên wan û çêkirina
bêmitmaneyek di navbera hemû
beşên Kurdiştanê de, ku rohn e
bo cîbicîkirina xwebikêmanîna
nîşî nû a Kurdiştanê, wan karan
encam dide.

Bi kurtî hekî em bixwazin en-
camgîriyê ji vê pîrosê bikin,
em dikarin bêjin ew meşe herwek
me îşare pê kir gelekmebestî ye:

1-Çavtirsandinkirina Kurdiştanê
û civatgeha medenî ya Kurdis-
tanê bi merema birina serê ya
xercê çalakiyên nasnamexwa-
zane.

2-Pêşgirtin bi bertekên civatgeha
medenî bi merema tehrîmên hil-
bijartina Serkomarî.
3-Fitneçêkirin di nav.

Partiyên Kurdî de, bi merema
berdan bi canê hev û derbelêdan
li xebata neteweyîya Kurd.

4- Sepandina cezaya giran bi ser
girtiyên siyasî yên wê dawiyê
yên Rojhilata Kurdiştanê de.

5- Çêkirina tirseke zihnî di nav
gelên xeyrekurd de.

6- Tevlîhevkirina dîroka Kurd-
îstanê û xelîtandina bîr û hizira
nîşî nû ya wê av û axê.

7- Rêxweşkirina zihnî bal xelkên
xeyrekurd bo êrişî hemû alî.

Sergotar



N: Kerim Perwîzî

Sala 1358 a Rojî, dema ku hîlbijartinek bo nûnerên meclisa damezraveya ya-saya bingehîn piştî şoreşa bi talanbirina xelkê Îranê hate kirin, li parêzgeha Urmiyê Dr. Qasimlo wekî nûnerê Kurd û Azeriyên akincî di wê parêzgehê de deng anî, lê Xumeynî ragihand ku hekî bê Tehranê em nahêlin here û emê wî îdam bikin.

Eva tev kîna ayetûllahekî kevneperestî bû ku Qasimloyê mezin wekî çîqekê li çavê îdolojîya wêran a xwe de didît û paşeroj li Xumeynî şîlû kiribû.

Sala 1368 a Rojî, di çîleya mirina Xumeynî de, ter-orîstên ku ji aliyê Refsencanî û Xamineyî ve hatibûne şandin, Dr. Qasimlo di cejna Qurbanê de kirin bi qurbanîya mirina celladê Cemaran û bi vî awayî xwestin Qasimlo li Kurdiştanê reş bikin û di Îranê de ti keleke bi bîr û bawer xwe di hember wan de ranegre.

Ew hemû pîlan û dijayetiya ku bo Dr. Qasimlo hebûn, yek li pey yek hatine pûçel-kirin û heta terora ceştîyî ya Dr. Qasimlo bû bi sedemê denkvedana zêdetir a bîr û bawer û xebata wî rêberê mezin ê netewî û demokrat, û ne tenê li Kurdiştanê, belkî di asta Îran û cîhanê de jî rejîma deştçêkirî a Xumeynî li hemû demê zêdetir rezîltir kir. Dr. Qasimlo, di jîyan û xebata xwe de, bi hemû şiyaneke

Dûbareya Xumeynî



ve di ximeta gelê xwe de bû û lewma salane hezaran kes di vê rêbazê de dibêjin: “Qasimlo, Qasimlo rêya de berdewam e”.

Ev berdewamiya Qasimlo li hizir, yad û di nav ruhê netewa xwe de ye ku berdewam xortên hogirê wê rêbazê bi bawerek qahîmtir ve tevlî karwanê xebata Rojhilatê Kurdiştanê dibin, rejîma paremayî ya Xumeynî li her demê zêdetir nîgeran kiriye û piştî çar dehik pîlan û sê dehik li terora ceştîya Qasimlo, niha jî kevtine ceştîya bîr û hizir û yada Qasimlo û bo vê karê xwe ye gemar jî tev pênûsên kirêgirtiyên xwe çalak kirine.

Bi çewtkirina çend rûpelek û çalakkirina çend pênûseke kirêgirtiyên xwe, ev nikarin rûmeta rêberê xîç bikin ku di nav tev belgeyên dezgehên îtila`at û sîxurên xwe de geran û heta piçûktirîn belge jî peyda nekirin ku derbeyekê li beşên din ên Kurdiştanê bide.

Dr. Qasimlo, dehik li pey dehikê, darêjer û avakerê pêwendiyên nav beşên cuda ên tevgerên Kurd bû û di wê pêxemê de jî tev têkoşerên rasteqîne yên hizb û aliyên siyasî yên tev beşan, şahidê kar û lixwederbasbûn û xemxwarî û meznahiya wî ne û ti hewcehiyek bi baskirin û berevanîkirin li wî nake, çimkî neteweyek bi wî nevî ve bi hereket tê û kela sitemkartirîn û ter-orîstirîn dever bi wî navê dihejin.

Eva ku di vê kurtenivîsê de hewce ye bê gotin û mebest e, eva ye ku di vê dem û satê de pîlan û hewla şikandin û xîçkirina navê şehîd Dr. Qasimlo, dûbarebûna hewlên bê bandor û şikestxwarina Xumeynî û peyrewên wî ne, ku tenê karîne ceştîyê Qasimloyê rêber ji me biştînin, û li asta meznahiya kesayetî û bîra wî de, ew pîşûyek in li hember gûpîka Qafê.

Çima şoreşa 1979ê di Îranê de çêbû?



N: Nûredîn Sofizade

Îsal 42 sal bi ser şoreşa gelên Îranê re derbas dibe, ku hemî xelkê Îranê di sala 1979an de, bi dijî rejîma dîktator a Mihemed Riza Şahê Pehlewî serhildan kirin û gelek nekêşa ku şoreş serkevt û tex û bextê rejîma Paşayetî tev hate pêçan û firedan bo nava kulfengê dîrokê.

Di kelêjana serkevtina şoreşê û sernixûniya rejîma Pehlewî, û revîn û bi cihêlana Îranê ji aliyê Şah ve di roja 14ê Kanûna Paşîn a 1979an de, 15 rojan piştî hingê Xumeynî ku li Firansê bû, pê balafirekê anîn û li Îranê peya kirin. Xumeynî gelek bi sanahî karî bi mifahwergirtin ji seha olî ya xelkê, siwarê pêla seha wan bibe û dest bi ser şoreşê de bigre û hêvî û armancên xelkê ku şoreş jêre kiribûn, bike bilqên ser avê û hemî destkevtên şoreşa gelên Îranê bi talan bibe.

Mixabin eva xelkê Îranê jêre şoreş kiribûn ti caran negihîştinê û ew 42 sal e ku xelkê wî welatî li jêr sitem û zilm û tepeserî û girtin û kuştin û bê mafîya rejîmeke herî dîktator û xwînmijtir ji rejîma ber de asê mane. Lewma nivşa îro û tazepêgihîştî ya Îranê, ji nivşa berî xwe, an dayîk û bavê xwe dipirsin we çima şoreş kir? We bona gihîştin bi çi şoreş kir?

Ez di vê gotarê de dixwazim bi kurtî bersiva wan pirsyan bidim ku şoreşa 79an çima û bo çi armancekê hate kirin. Gorî amaran %65 heşîmeta îro ya Îranê ev kesane ku piştî şoreşê ji dayîk bûne. Ev di serdemê de dijîn ku cihanê pêşkevtinên mezin bi xwe ve dîtine, serdemê informatîk û teknolojiyayê



ye, serdemê geşekirina astê hişyariyê ye, serdemê emrazên herî pêşkevtî yên peywendîgirtinê ye, serdemê gemiyên esmanî û dîcîtalê ye, serdemê soşyalmediayê ye, ku wisa ye bi berçavgirtina zemanê wan 42 salên derbasbûyî, û gorî serdemê berî şoreşa gelên Îranê guhartinekî mezin çêbûye.

Nesl anku nivşa berî we di serdemê de şoreş kirin ku heşt bi zilm û dîktatoriyê dikirin, wan wisa dizanîn ku hewcehî bi azadî û demokrasî û wekhevîyê hene, bo wan giran û dijwar bû ku di welatekê de dijîn ku mafê azadiya siyasî nînin, demokrasî nîne, serwet û heyiya welat di destê malbatekê de ye, hîlbijartin çinîne, dengê rexne û gazindan bi girtin û îşkence û kuştinê tête danê, nivşa serdemê rejîma paşayetî ew hişyariya hebûn û bona gihîştina bi wan hêvî û armancan şoreş kirin. Belê renga di alternatîva cihê rejîma Şah de şaş bin û ceribandina hikûmeteke Îslamî nekiribûn û nedîtibûn. Her eva bû ku piştî gihîştina Xumeynî û taqîm axûndên hev hizrên wî, û di destpêka hêviyên xelkê de, dîtin ku rejîmek hatiye ser kar ku rêberê wê dibêje xwîne birêjin, partiyên ji nav bibin, azadiyan nehêlin, dengê cuda ji dengê xwe tepeser kir, cuxên îdamê danan, para xelkê Îranê li jêr deshilata rejîma Îslamî de

bû şîn û girî û şer û tepeserî, sêdare, bîrsîbûn, bê karî, giranî, teror, dizî, gendelî. Lewma nivşa ku rejîma Şah sernixûn kirinî zanîn ku hekî gotî li ber ba kevtine ber baranê û dîktatoriyekî çend qat zêdetir perê xwe bi ser Îranê de kêşaye.

Yekemîn karê wê rejîmê jinavbirina wan kes û aliyanê bû ku rolê sereke di serxistina şoreşê de hebûn û alîkar bûn ku Xumeynî û rejîma wî bête ser kar.

Îro rojê nivşa nû dibe ji xwe bipirse ku ew çiqas xwe erkdar dizanin bona xebata jinavbirina wê zilm û zor û bê mafîya ku li ser wan e? Hekî nivşa berî wan xwedan xîret bûn û dîktatorek sernixûn kirin, renga di anîna ser kar a bedîl de jî şaşî kiribin ku paşê poşmanî çi derdekê wan derman nekir, erê gelo nivşa nû ku bê guman hişyartir û di serdemê golobalîzmê de dijî, çi dikin bona gihîştina bi azadî û demokrasî ku îro mafê herî destpêkî yê mirovan e? Di vê navberê de hewce ye ku em basê şanaziya gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê jî bikin.

Hemî xelkê Îranê û doşt û dijmin baş bîra wan de ye ku kite xelk û neteweyek ku her di destpêkê de naveroka wê rejîmê nas kir û di bi nav refrandoma diyarîkirina sîstema hikûmetî de ku di 1ê

Nîsana 1979an de bi rê ve çû beşdarî nekir û Xumeynî û taqma xwe tenê rêka sepandina rejîma xwe danabûne hîlbijartinê.

Gelê Kurd ew 42 sal e berxwe dide û bona gihîştina bi mafê neteweyî û rizgariya Kurdistanê ji dest dagîrkariyê dixebite û teslîm nebûye. Gelek hêz û alî û dijberên rejîmê taze piştî derbasbûna 42 salan dizanin ku gelê Kurd çima ew rejîma qebûl nebû, baş dizanî ku dîktatoriyekî gelek xirabtir ji ya berê perê reş e xwe bi ser hemî Îranê de kêşandiye, lê gelê me yê rizgarîxwaz heya îro rojê jî îzn nedaye ku xevna rejîmê di Kurdistanê de hasil be, heta niha jî bi xebata xwe neçûye jêr sîbera reş û nehêlaye perê reş e xwe bi rehetî bi ser Kurdistanê de bikêşe.

Lewma bona gihîştina bi azadî û demokrasîyê û mafê netewî û cehdkirin bona sernixûniya wê rejîmê, Kurd û Kurdistan pêşeng in, û bi berçavgirtina rewşa niha ya rejîmê ku li ser kendalê sernixûniyê ye, tenê hewcehî bi rabûn û yekdengîya seranserî heye û nivşa nû hewşeweya nivşa berê bikarin rejîmeke dîktator sernixûn bikin û bi ceribandina berê û şaşiyên hatinî kirin, bikarin bigîjne jiyana û azadiya herî jêhatî ya mirovên serdem.

Bi hêviya wê rojê ku ez bawer im ne gelek dûr e.

Şerê nerim û çewtekariyên rejîma Îranê li dijî Kurd



N: Mihemedsalih Qadirî

Rohn e ku avabûn, berdewamî û pêşketina her core hikûmet û desthilateke Kurdî di her cihekê de, li ber vê yekê ku dikere heyameke dirêj karlêkerî li ser doza Kurd bi awayekî giştî hebe, dewletên deverê çavê dîtina wê nînin, Îran jî yek ji wan dewletan e; Lewma bi berdewamî bi awayên cuda, hewla lawazkirin û afirandina rûkekî xirab û kirêt li tevgera siyasiya Kurd bi giştî dide. Bo vê yekê jî mifah ji emrazên sexte, hêz û nermehêz jî wergirtiye.

Dezgehên ragihandin û mîdyayên Îranî ku rasterast di bin çavdêriya “Beyta Rehberî” a Xamîneyî de ne, bi hevkarîya Spah û kanalên diplomatîk yê Wezaretê Derve, çavkaniya sereke ya şerê nerim yê wê rejîma ne û di çarçoveya planeke start-ejîk de, bi armanca dijatîkirin digel bizava rizgarîxwaziya Kurdiştanê û sivikatîkirin bi hêza polayîn a pêşmerge û şikandina şana rêberên Kurd, her carê bi awayeke dûr ji exlaqên ragihandinê, bi çewtekarî li raştiyan û dîrokê, çendîn core nivîsên çewt û çendîn drama û film berhem anîne û mekîneyeke mezin a piropagende bona dijatîkirineke sistematîk digel tevgera siyasî û xelkê Kurdiştanê bi rê xistiye.

Rejîma Îranê di wan 3 dehekên derbasbûyî de, bi 10an pîlanên cor bi cor li dijî Başûrê Kurdiştanê bi rê ve birine û çî bi awayê agirxweşkirin bo alozî di navxwe de be, an bi rêya tedaxula ewlehî û leşkerî yan jî bi piropagendeya reş, berdewam hewla jinavbirin



û reşkirina rûkê desthilata Kurdî li Başûrê Kurdiştanê dane. Rejîma Îranê bi armanca rewayêdan bi wê dujminayetîkirina xwe, berdewam Herêma Kurdiştanê wekî Îsraîla 2 û berhema destên biyaniyan bi nav dike û di rastaya wê hizra şerxwazane de, bi hevkarîya Serokwezîrê Berê yê Îraqê, “Nûrî El-Malikî”, bi senaryoya revîndana zêdetir ji hezar kesên ser bi “El-Qaîde” ji girtîgeha “Ebû Xerîb” a Îraqê û hevkarîkirin digel avabûna “DAÎŞ”ê, pêgeha pîlanên mezin bona jinavbirina Hikûmeta Herêma Kurdiştanê darêt û piştê karîn bera êrişên “DAÎŞ”ê ji Şam û Bexdayê ber bi aliyê Kurdiştanê ve biguherin.

Digel destpêkirina êrişên “DAÎŞ” bo devera Mûsil û derdora wê, me dît ku hêza bi hezaran kesî ya Arteşa Îraqê û milîsên ser bi Îranê ku Malikiyê Serokwezîr Fermandeyên wan yê giştî bû, tevî amadebûna wan hemû çekên giran û tank û zirêpoşan, nekarîn di hember êrişên terorîstî yê “DAÎŞ”ê de xwe ragirin û tûşî şikestê bûn û 1 li ser 3 a axa Îraqê bêtî berxwedanekê wekî senariyoyeke berêdariştî radeştî terorîstên “DAÎŞ”ê kirin.

Dema ku hêzên “DAÎŞ”ê karin bi wan çek û cebilxaneyên zêde yê ku kev-tibûne destê wan êrişî li ser “Şengal”ê bikin û wê karesata mirovî bi ser Kurdên “Êzîdî” de bînin, wê carê hêzên “DAÎŞ”ê bi handana wan ji aliyê rejîma Îranê ve, êrişî li ser deverên din

yê Kurdiştanê kirin, hêza Pêşmerge Başûrê Kurdiştanê, bi wan îmkanatên kêma ku hebûn, xwe rêk xistin û hêdî hêdî êrişên destpêkî yê “DAÎŞ”ê şikandin. Raşt e ku di wê demê de rejîma Îranê bona veşartina şûnpêyên xwe di wê pîlana li dijî xelkê Kurdiştanê û bi şandina “Qasim Silêmanî” yê terorîst û bi çend gulle top û fişekên rizî, alîkariya pêşmerge kiribûn lê, bo vê ku şika handana DAÎŞê bona êrişkirin bo ser axa Kurdiştanê li ser xwe vêde bibin.

Di berdewamiya şerê digel “DAÎŞ”ê de ku bi hezaran pêşmerge şehîd û birîndar bûn, hêzên hevpeymanan bona şer li dijî “DAÎŞ”ê ku bi serokatiya Amerîka û beşdariya çendîn welatên Ewropayê û çendîn welatên dinê pêk hatibûn, ecêbgirtiye hêza berxwedana Hêzên Pêşmerge û şervanên Kurd bibûn ku wekî tenê hêviya şikandina efsaneya DAÎŞê di meydana şer de bi egîdî rol hebûn, lewma dest bi şandina hevkarîya locîstîkî bo pêşmerge kirin; Dema Îraniyan di Îraqê de hay jê wê yekê bûn, taqeta wan nema û bi handana dewleta Îraqê, rêgirî ji gihîştina beşeke herî zêde ya wan alîkariyan kirin ku negihîje bi destê pêşmergeyên Kurdiştanê. Ew di demê de bû ku hikûmeta Îraqê, hemû milîsên ser bi rejîma Îranê di Îraqê de pêka yasayan wekî beşek li hêza berevaniya Îraqê erê kirbûn û mûçe bi wan re dida û bi qasekî zêde cebilxane jî xistibû ber destê wan.

Hekî Îraniyan bi raştî şerê “DAÎŞ”ê dikirin, boçî serkirdeyên “DAÎŞ û El-Qaîde” di Îranê de bêhna xwe vedidin? Bo “DAÎŞ”ê bi tenê mal û xanî û axa Sinniyan û Kurdan kawil dikirin û ew rastî karesatên mirovî dikirin? Bo dema ku hêzên DAÎŞ, nêzî Bexdayê bû rawestîyan û rû li Kurdiştanê kirin û êriş kirine ser Kurdiştanê? Bo ti kes napirse ew “DAÎŞ”iyên ku Îranê bi “mecûsî” bi nav dikin, heta bo yek çirkê jî, bera tifengên xwe nedane aliyê Îranê?

Li doma dujminatiya Îraniyan digel Başûrê Kurdiştanê, piştî wê ku pîlanên “DAÎŞ”ê ji aliyê Hêzên Pêşmerge ve hatine pûçkirinê, dema xelkê Kurdiştanê refrandoma “serxwebûna Kurdiştanê” bi awayekî serketiyane bi rê ve birin, wê carê me dît ku heman leşkerên li şer revî yê Îraqê, bi pîlana rasterast a Îranê û milîsên wê, êrişî li ser Kurdiştanê kirin û karîn “Kerkûk” û çend deverên din yê Kurdiştanê ku bi cangorîkirina pêşmerge ji destê “DAÎŞ”ê hatibûne rizgarkirinê, dagîr bikin û xelkê Kurdiştanê rûbirûyê çendîn pîlanên din yê herêmî û navxweî bikin.

Bi alxahîni ve ku berhemanîna wan kurtefilmaneyên ku di wê dawiyê de ji aliyê rejîma Îranê ve bi tenê bona xeletandina xelkê zûbawer û xelitandina hizra giştî ye û ya

»»»Doma R:4

ku “Qasim Silêmanî” yê terorîst pehlewane têkşikandina “DAÎŞ”ê bûbe, dereveke şaxdar û dûr ji raştiyê ye. Hekî Îranî hinde netirs in, bo tevî xerckirina bi milyardan Dolar û dabînkirina bi 10an hêzên bi kirêgirtî, heta niha jî otorîteya “DAÎŞ”ê li Sûriyê bişkênin? Ya raşt ev e ku Îraniyan nexwestine wê girûpa terorîstî ji dest bidin, ber wê yekê ku bi sedema amadebûna “DAÎŞ” li Sûriye û Îraqê, bi berdewamî hewla serkutkan û guherîna demografiya deverên “Sunni” û bi taybet dujminatîkirin digel Herêma Kurdiştanê daye.

Veşartî nîne ku di dema xwe de, ji aliyê birêveberiya

Herêma Kurdiştanê ve, çendîn caran û di hilkeftên cuda de spasiya tev aliyan û bi taybet bi neheqî û bi qaseke zêde jî spasiya Îranê kirine ku hevkarî gihandine pêşmerge; Lewma ez dibêjim bi neheqî, çimkî li 3 dehekên derbasbûyî de, Îraniyan bi berdewamî hewla alozkirina Herêma Kurdiştanê dane û bi afirandina fitneyan, bi şandina terorîstan û teqandinan, bi şandina madên hişber û “Pereştûyan”, bi şerê saybêrî û ragihandinê bona xirabkirina rûkê Hikûmeta Herêma Kurdiştanê û birêveberên wê ber çavên xelkê, bi dorpêçkirinan û bi çendîn pîlanên cuda yê dujminatî yê din, hewla jinavbirina ezmûna Herêma Kurdiştanê daye heta ku bi wê rêyê ve bi Kurdên Rojhilatê Kurdiştanê bibêjin bêdeng bin, eva ew desthilata Kurdî ye ku, hûn

xevnê pêve dibînin.

Bê şik, armanca sereke ya Îraniyan di wê filmê de ku hevkarîya Hêza Pêşmerge kirine, kareke armancdar e û bi zanebûn û bilî şikandina kerameta netewî û serweriya Kurdiştanê, ti merameke xêr di pişt de nîne. Karbideştên rejîma Îranê dibe bizanin ku bi derewkirin û gotinên bêbingeh, ne dikarin Qasim Silêmanî bikin bi qehreman û ne dikarin derbê li meznahiya xelkê Kurdiştanê û qehremaniya Hêza Pêşmerge Kurdiştanê bidin.

Hekî rejîma Îranê bo yek rojê jî xema Kurd û Kurdiştanê berçav be, bo çî hemû rojan ref bi ref xelkê Rojhilatê Kurdiştanê bi kom binçav dîke û ew hinde ciwanên Kurd îdam dîke û kolberên reben û bê desthilat dide ber

gulleyan? Bila Îranî û dujminên Kurdan alxahîn bin ku nikarin dîrok û raştiyan, bi çîrong û kurtefilmên çewtekarane biguherin û îradeya Hêza Pêşmerge Kurdiştanê bi ti pîlan û hêzeke dujminkariyên wan naçeme.

Kurdên Rojhilatê Kurdiştanê dibe axavtina wan rû bi rejîma terorîstî ya komara Îslamî ya Îranê be ku rojane xelkê Kurd tepeser dîke, bi hezaran carê mafê mirov binpê dîke û dahata xelkê terxanê berjewendiyên xwe dîke û qateke taybet pê dewlemend dîke; Rejîma Îranê bona veşartina wan zulm û sivikatîkirinên sistematîk ku li xelkê dîke, dixwaze ku Kurdan bi xwe re mijûl bike û di navbera wan de mijûlê şikandina hev bin, lewma gelek girîng e ku agehdarê wan pîlanan bin.

Îsraîl gefa êrîşa leşkerî li Îranê dixwe

Rejîma Îranê ku niha wekî Rvîrûsa Koronayê berbûye bo canê cîhanê û gefek e li ser ewlehiya welatên deverê û cîhanê.

Rejîmek ku maka terorîzma cîhanî ye, niha jî bi çêkirina bombeya navkî dibe bi welatek metirsîdar li ser ewlehiya cîhanê û ev yeka jî bo welatên deverê û nemaze welatên cîhanê cihê qebûlkirinê nîne.

“Antonî Bilînkên”, Wezîrê Derve ê Amerîkayê, gotiye Îran hekî bi wî awayî meyndina Uraniyomê ber bi pêş ve bibe dê çend hefteyên bê de bigihe bi bombeya navkî. Ev yeka cihê qebûlkirina welatê Îsraîlê nîne. Hin berpirsên payebilind ên Îsraîlê dane zanîn ku terha Artêşê ya bo êrîşkirin li ser Îranê pêdaçûne dikin.

“Avîv Koxavî” Serokê Stada Artêşa Îsraîlê, hefteyek berî niha goribû, min destûr bi Artêşê re daye ku hin terhan pêdaçûnê bikin ku em bikarin êrîşê ser Îranê bikin.

“Binî Gantêz”, Wezîrî Berevanî yê Îsraîlê jî di civînekê digel kanala televîzyonî



ya bi navê “El- Xed” a welatê Misrê got: “Armanca Îsraîlê eva ye ku Îran nahiye bi bombeya navkî û ev yeka tenê bi qazancê Îsraîlê nîne belkî bi qazancê cîhan û deverê ye”.

“Gantêz” di vê civînê de gotibû: “Hin bijarde li ser mase ne ku Îran nahiye bi bombeya navkî”. Lêdwan,,

Rejîma Îranê ji gefên Îsraîlê ditirse û Mihemedcewad Zerîf jî daye zanîn ku hekî dewleta Co Baydîn bide zanîn ku dixwaze bizavire rêkkevîna Bercamê, Tehran demûdeşt dê bersivê bide. Berê jî Elî Rebî`î, Berdevkê rejîma Îranê, bo zivirîn bo rêkkevîna Bercamê huşdarî dabû û gotibû: “Pencereyên derfetan bo hertimî navebin”.

Îsraîl jî danîna tehrîman bo ser Îranê bi bandordar dizane û Avîv Koxavî gotibû tehrîmên dewleta Tramp li dijî Îranê, rejîma Îranê gelek lawaz kiriye.

Îsraîl, rejîma Îranê gefeke micid li ser ewlehiya xwe dizane, her lewma her demê, his bi metirsiyê kiribe, hêzên rejîmê kiriye bi armanca xwe, û nemaze di Sûriye û Îraqê de hersal çendîn caran êrîşê esmanî dîke ser binkeyên Spaha Pasdaran a terorîst û wan digel axê yeksan dîke.

Şerê medyayî û psîkolojîkî yê rejîmê li hember gelê Kurd!



N: Dara Natiq

Rejîma direvan û dîktator a Îranê di heyamê borî de car din û bi awayekî pîlandarêtî dest bi şerê nerim û çêkirina film û dêkomêntarên direvîn bi dijî tevgera azadîxwaz a Kurd û nemaze partiyên mafxwa û şoreşvan yên Rojhilata Kurdistanê û beşên din yên Kurdistanê jî kiriye.

Rejîma direvan her di yekem roja bideştvegirtina deshilatê heya niha siyaseta xwe li ser bingeha direvan û xapandina raya giştî a xelkê Îranê û civatgeha navneteweyî meşandiye. Ev siyaseta han yek ji taybetmendiyên hikûmet û deshilatên dîktator û paremayî ye ku hertim raştiya civaka xwe berevajî û li gor meslehet û qazancên xwe nîşan didin û bo weşartina kêmasiyên xwe bi vî awayî civatgeh û raya giştî dixapînin.

Rejîma Îranê tu carî cuda ji tepeserî, kuştin, îdam, zîndanî û bînpêkirina mafê mirov û nemaze zevtkirin û dagîrkirina axa Kurdistanê û netewên din yên Îranê, bi sedema meşandina siyasatên xwe yên dujminkarane di asta herêmî û cîhanî de, civateha Îranê bi krîzek kûr û bingehîn a aborî û siyasî û jîngehî re hevriş kiriye, lê ti car raştiya krîza heyî wek xwe ji xelkê û raya giştî re neda eyanê û hertim bi çêkirina dêkomêntar û belgeyên direvîn û bi gotina hin peyvên weke pîlanên dujminan, sîxurî, nifûza dujmin, xiyanet, êrîşa derekî û destên pişt perde û gelek gotinên din civaka xwe û raya giştî dixapîne.

Rejîm dixwaze bi çêkirina wan belge û filman raştiya doza berheq û mafxwaz a gelê Kurd di Rojhilatê Kurdis-



tanê de çewaşe bike û rûçkê biyûm û zilm û zordarî û dagîrkariya Kurdistanê li ber çavê giştî wunda bike û şerek psîlolojîkî bi doza azadîxwaz û civaka Kurdistanê re bike.

Li Rojhilatê Kurdistanê tîrsek zêde ya rejîma Îranê ji îradeya gelê Kurd heye. Rejîma Îranê bi salan e li hember Kurdên Rojhilatê Kurdistanê bi polîtîkayên tund tevdigere û di bin navê sûcên siyasî, bi awayên cuda bêyî dadgehkirina vekirî û qanûnî Kurdan bi dar ve dike. Em dikarin bêjin dîroka rejîma Îranê li ser çêkirina direv û boxtan, çewaşekirin û xapandina raya giştî, çêkirina natifaqî û şerê rewani, şer û pawaxwazî, dizî û teror, tundî, zext, kuştin û bidarvekirinan hatiye avakirin.

Îran li cîhanê ji aliyê darvekirinan ve di rêza yekemîn de ye. Heta niha li hember vê zilma rejîmê dengeke xurt li qada navneteweyî derneketiye. Ji ber vê yekê dewleta Îranê her sal bi dehan Kurd, şoreşger û çalakvanan bi dar ve dike.

Herwiha rejîma Îranê di rojên borî de li bajarên Rojhilat û Tehranê li hember çalakvan û welatîyên kurd


dest bi binçavkirinan kiriye û bi dehan çalakavan, xwendekar û welatîyên kurd hatibûn.

Di heyamê zêdetir ji çar dehekên borî de rejîma Îranê bi berde-wam hewil daye ku bizava mafxwaz a gelê Kurd bi ji nav çû û hilûşandî bide nîşandan û bi çêkirina film û berhemên saxte û direvîn bizava Kurd û rêberên wê bi girêdayê dewlet û hikûmetên herêmî û dijberê Îranê bidin xuyakirin û wê bizava berheq pêş çavê civaka Kurdistanê û Îranê bi giştî bixin. Demûdezzgehên ragehandinî û medyayî di Îranê de di bin fermana raşte raşt a Xaminyî û bi harîkariya Spaha terorîst a Îranê û torên dîplomasi a Wezaretê Derve a wî welatî, çavkaniyên sereke yên şerê nerim a wê rejîmê ne û li çarçêveya pîlanekî sitratêjî da bi merema dijberîkirina tevgera rizgarîxwaz a Kurdistanê û sivikatîkirin bi hêza polayîn û qareman a pêşmerge û şikandina rêberên Kurdan û her carê bi awayekî û bi formek cuda û bi avayek dûr ji pîrînsipên exlaqî û medyayî, bi çewaşekirina raştiyên dîrokî, gelek nivîsinên nerast û film û dêkomentên bi bingeh û direvîn, dijatiya xwe li hember bizava azadîxwaz û neteweyî a xelkê Kurdistanê daye nîşandan û jehra xwe li hember heqîqet û hebûna gelê kurd de rêtye.

Rejîm ji hemî awayekî û bi pîlanên herî qirêj û kirêt ên xwe dijberiya bizava kurd dike û ji bo asimîlekirin û tunekirina Kurdan kompiloyên gelek mezin û hovane lidar dixwe, lê di raştî de heya niha jî nekariye dengê mafxwaz û berheq yê Kurdistanê û bizava rizgarîxwaz a Kurd bifetisîne û belkî îradeya şoreşvanî û mafxwaz a netewa me li Rojhilatê Kurdistanê roj li roj bilindtir dibe û Kurdistanê bûye çepera berxwedan û dijberîkirin li hemberî wê rejîma faşîst û dijîmîrov a Tehranê.

Bizava Kurd û îrade û dengê şoreşvan û azadîxwaz yê xelkê Kurdistanê bûye moral û hevxebatîya gelkê azadîxwaze Îranê li hember wê nîzama dîktator û xebat û avakirina Îranek demokratî û fedrila ku tev netewên Îranê û nemaze gelê kurd bi mafên xwe şad bibin û azadî û serbestî û kerameta mirovî ji civaka belengaz û dagîrkirî wî welatî re wegere. Êdî direv û siyaseta xapandina xelkê û weşartina raştiyan dema wan bi ser çûye û gelkê Kurd û civatgeha Îranê bigiştî hişyartir û çav wekirîtir ji wê hîndê ne ku rejîm bi wan film û dêkomentên saxte wan bixapîne.

Nerîna Lîderan



“John Bolton”:

“Take çareser bo çareserkirina arîşeyan di deverê de, çêbûna dewleta Kurdistanê ye û hewce dike ku kabîneya “Biden” zêdetir girîngiyê bi prsa Kurd bide”.



“Benny Gantz”:

“Armanca Îsraîlê eva ye ku Îran negihe bi bombeya navikî û ev yeka tenê bi qazancê Îsraîlê nîne belkî bi qazancê cîhan û deverê ye”.



“Yasîn Ziya”:

“Şemxanî têgihîştinek nederust ji Taliban heye”.



“Hesên Rûhanî”:

“Ti kes an bendek bi Bercamê zêde nabe”.

Hewla qirkirina çandî ya Kurdên Qezwînê ji aliyê rejîma Tehranê ve!



N: Eskender Ceiferî

Kurdên Qezwînê ku weke Kurdên koçber ên Xurasanê ku di 3 qonaxan de ji zêdetirî 500 salan beriya niha ve ji Kurdiatanê ji bo wir hatine koçberkirin, hertim ji aliyê rejîma faşîstên Tehranê ve raştî hewlên asîmîlekirinê weke qirkirinê siyasî û çandî hatine.

Herî dawî ew ji beşdarî di heftemîn festîvala bîranîna Elîşah Xan Heyderîzade helbestvanê Kurd de bêpar bûn. Di festîvalê de nivîskarên Kurd ji Hemedan, Loriştan, Ormiye, Sine, Kirmaşan û Îlamû beşdar bibûn.

Bê guman, ev tê wateya rêgirîkirin li pêşketia çand û hebûna wan, Ev rêgirtin, bînpêkariya yasayên maf û azadiyan e ku li gor wan, her kes bêyî ku ji ber ziman, ol, baweriya siyasî yan jî yeke din jêbûna neteweyî û ayn jî civakî, mal, zayîn an jî rewşeke din bibê, xwedî sîdwerigirina ji hemû maf û azadiyan.

Ew piranî ji herêmên bakurê Rojhilatê Kurdistanê ne. Her ji dema deşhilata Mannayan ve wate ji sedsala 9’an ya beriya zayînê ve ew li Kurdistanê xwedî bandor bûn. Di dema çêbûna Împeratoriya Medan de rengê cudahiyên li navçeyê û dîsa jî tevlîbûna hêzan derdikeve ku Kurdên Kurmanc jî yek ji wan in.

Kurdên Qezwînê, her ji dema koçandina wan ve heya niha guh nedane deşhilata navend. Lewma jî serxwebûn ji bilî bêpparkirina wan ji postêndewletî ku hejmara wan sedan hezar kes in, hewla jinavbirina çanda wan jî her û her berdeham dike.



Piştî derbasbûna hezaran salan ji deşhilatdariya Kurdan li Kurdiştana niha, dem derbas bû û deşhilat bû ya Şîeyan. Di salên derdora 1590’an ya zayînê de hewla koçberkirina Kurdan ji Ormiye, Xoy, Makû û Selmasê ji bo Qezwîn û Xurasanê dihat dayîn. Ew di salên di navbera 1598’an de heya 1602’an yê zayînê ji bo wan navçeyên dûrî Kurdiştanê hatin koçberkirin da ku welatê Farsan biparêzin. Ew koçberkirin di encama civînekê de hat ku di navbera Şah Ebbasê Sefewî û mezinên Kurdan re hate lidarxistin û serokhozên Kurd bi Sefewiyan re li ser koçberkirina wan lihev hatin. Beriya wê di şerê Çaldiranê de ku di sala 1514’an de çêbû, Kurdiştan bibû du perçe. Lê koçberiyê jî nekarî heşt Kurdbûnê di dilê wan de rake.

Di hemberî koçberiyê de hatibû misogergirin ku wê mafê wan li Qezwîn û Xurasanê paraştî be. Lê her ku ew gihane cî, deşhilatdaran, her tişt ji bîr kir.

Ev cara yekemîn nîn e ku aştengî li hemberî çalakiyên Kurdên wan navçeyan çêdibin. Beriya niha jî, wezaretê Çanda Îslamî ya Îranê, rê nedabû festîvaleke çabdî ji aliyê Kurdên navçeyên Qezwîn û Xurasanê ve bê lidarxistin. Festîvala Pîran Çengî ku her sal li bajarê Qûçanê li Bakurê Xurasanê bi hevparî ligel Kurdên Qezwînê birêve diçû û tê de hunermendên Kurd yê herêmê û bi taybetî kesatîyên naskirî yê muzîka kevn ya vê herêmê beşdar dibûn, di salên derbasbûyî lê hate girtin û îzna birêveçûnê jê re nehat dayîn.

Ev di demekê de bû ku ji bo wê festîvalê ji aliyê Kurdên koçber ên wan du herêman ve xerçeke zêde hatibû meza-xtin.

Ev kiryar jî hemû bîngêhên Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan bînpê dike ku li gor wê, mafê çalakîyên welatîyan bêyî liberçavgirtina sîstema dadwerî yan hokarên din yê weke qewmîyet, netewe, dîn yan bawerî, heye.

Weke ku çawan beriya çend salan jî Mihemed Neqî Lutfî nûnerê Elî Xaminêyî li parêzgeha Îlamê ya Rojhilatê Kurdistanê û pêşnimêjê bajêr gotibû nabe Zimanê Kurdî û nivîsa Kurdî li Îlamê hebe û divê pêşiya çalakîyên bi zimanê Kurdî were girtin, li Qezwînê jî heman rewş heye. Cîgirê parêzgarê wir di civînekê de ragihandibiye ku dijberên Komara Îslamî dixwazin hesta nasyonalîstî angû hesta netewî di nav xelkê vê parêzgehê de çê bikin yan jî vejînin û berfireh bikin. Wî berpîrsê bilind ê Îranî ji sazîyên ewlehî xwaştibû ji bo bêbandorkirina partîyên Kurdî li wir tevbigerin. Gotinên bi wî rengî hertim raştî nerazîbûna çalakvanan tî lê di hember de cihê wan çalakvanan dibe girtîgeh.

Tevî ku rejîma gemar a Komara Îslamî ya Îranê benda yekem ya Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan bi bêpparkirina xelkê ji azadiyan ji wan standîye, benda duyem jî ku amaje dike ji ber statuya siyasî, hiqûqî an jî ya navnetewî di navbera mirovan de cudayî nayê kirin û welatî li cem dewletan divê wehkev bin, bînpê dike.

Qonaxa sêyem ya danûstandinên ENKS û PYNKê destpê dike

Civînên destpêkirina qonaxa nû ya danûstandinên Partiyên Yekîtiya Niştimanî ya Kurdî (PYNK) û Encûmena Niştimanî ya Kurd li Sûriyê (ENKS) îro, 03/02/2021 destpê kirin.

Dîmenên taybet yê çûna şanda ENKSê ji bo nav civînên îro gihîştin Rûdawê û di wan dîmenên taybet de xuya dibe ku otomobîlên protokolê yê Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD) diçin ofisa ENKSê û ji wir jî berê xwe didin cihê civînan ji bo destpêkirina qonaxa sêyem a danûstandinan.

Di wan dîmenên ku gihîştine destê Rûdawê de diyar dibe ku Mihemed Îsmail, Silêman Oso, Nimet Dawid û Fesla Yûsif di şanda ENKSê de cih digirin.

Şanda ENKS, berpîrsên Wezareta Derve ya Amerîkayê û Fermanarê Giştî yê HSDê Mezlûm Kobanî, berî 2 rojan civiya bûn û li gor zanyariyên Rûdawê re civîn erênî bûye.

Li gor zanyariyên Rûdawê di civînê de, tekezî li ser girîngiya qonaxa nû ya danûstandinan hat kirin ku dê gelek pîrsên heştîyar tê de bêne gotûbêkirin û egera wê mezin e ku ew pîrsgirêk di encama vê gera danûstandinan de bigihjin çareseriyekê.

Mijara beşdarbûna ENKSê bo nava Rêveberiya Xweser, peyman a civakî, pîrsa vegeza Pêşmerge Roj û tevlîbûna bo nav HSDê, beşek ji wan babatên heştîyar in ku di vê qonaxa sêyem de gotûbêjê li ser bîn kirin.



Partiyên Yekîtiya Niştimanî ya Kurd
أحزاب الوحدة الوطنية الكردية

Li aliyê din ENKSê îro berî biçe bo nav civînan, li Qamişlo civînek lidar xist û têde rewşa dawiyê û qonaxa sêyem ya danûstandinan gotûbêj kir.

Di civînê de endamên Desteya Serkoayetiya ENKSê û partiyên di nav de beşdar bûn û ENKSê di civînê de pitgiriya xwe ya ji bo diyaloga Kurdî-Kurdî dûpat kir û hat tekezkirin ku ew hewl bidin ku diyalog serbikeve. RÛDAW

Divê Tirkîye hebûna YPGê qebûl bike

Berpîrsê Weqfa Heinrich Boll Kristian Brakel tekez dike, “Amerîka nikare deşt ji YPGê berde û divê Tirkîye hebûna YPG li ser sînoran qebûl bike.”

Berpîrsê Komeleya Heinrich Boll Stiftung a li Tirkîyê Kristian Brakel beşdarî bultena 15.00 a Rûdawê bû ku taybet bi Bakurê Kurdiştanê û behsa çarenivîsa peywendiyên Tirkîye û Amerîkayê di heyama serokatiya Joe Biden de û helwesta Tirkîyê ya li hember Rojavayê Kurdiştanê û hêzên Kurdî kir.

Kristian Brakel di wî wê baweriyê de ku di serdema Jode Biden de jî “peywendiyên di navbera Tirkîye û Amerîkayê de dê wek xwe bimîne û îdareya Biden siyasî setên berê yê Amerîkayê berdewam bike.”

Lê Brakel behsa hinek astengiyan dike li ber başbûna peywendiyên herdu aliyên û dibêje, Enqere amadekariya xwe nîşan nedaye ku di siyaseta xwe de guhertinê bike wek û sîstema S-400 a Rûsî ku Tirkîyê kiriye û

piştevaniya berdewam a Amerîkayê bo Yekîneyên Paraştina Gel (YPG), wek “aşteng” dibîne.

Li egera pêkanîna guhertinekê di siyaseta xwe de ji aliyê Tirkîyê ve, wek ku deşt ji S-400 berde û Amerîka jî piştgiriya bo YPGê qut an jî kêmkirî bike, Kristian Brakel di wê baweriyê de ye, “Guhertinên mezin dê çênebin, divê Amerîka piştgiriya YPGê bike û di heman demê de jî piştgiriya Tirkîyê ji deşt nede.”

Braker behsa wê jî dike, egera wê heye ku îdareya Biden di siyaseta navxwe û ya derve de guvaşên zêdetir bixe ser Enqerê.

Li ser mijarên sîstema berrevaniya asmanî ya S-400 û bernameya firokeyên F-35, Braker diyar kir ku gelek hewl hatiye dayîn ku çareseriyek ji bo pîrsgirêkan bê dîtî û Tirkîye vê sîstemê bi kar neyîne û amaje bi wê jî dike, “S-400 beşek ji peywendiyên di navbera Tirkîyê û Rûsyayê de jî.”



Braker dibêje, Amerîkayê ragihandiye ku wan hewl dane ku nîgeraniyên Tirkîyê yê derbarê PKK de kêmkirin û tekez dike, “Divê Enqere helwestek nerm nîşan bide û hebûna YPGê ya li ser sînoran qebûl bike.”

Derbarê bandora peywendiyên Tirkîye û Yekîtiya Ewropayê (YE) li ser peywendiyên Tirkîye-Amerîkayê jî Braker dibêje, Amerîkayê peywendiyên cîyawaz li gel Tirkîyê hene û “bi hatina Biden hêviyek peyda bûye ku Tirkîye wek ku di serdema îderaya Trump de kiriye, êdî nikaribe ajandaya xwe firehtir bike û pêştir bixe.” RÛDAW

Bi sedema du bûyerên hatûçûnê 24 kes bûne qurbanî

Roja Înê 10ê Befranbarê, bi sedema du bûyerên hatûçûnê li rêya Tîkab bo Textê Silêman û rêya Kirmaşan bo Kamyaranê, 6 welatîyan canê xwe ji deşt dan û 18 welatîyên din jî birîndar bûne.

Bi sedema qezaya hatûçûnê ya du mînbûsan li rêya Tîkab bo Textê Silêmanê, 17 kes birîndar bûn û kesekê jî canê xwe ji deşt da.

Ew du mînbûsane yên veguhasîna kedkarên kangeya zêrê “Rizeşoran û Axder” bûne û her di vê derheqê de, kesekê canê xwe ji deşt daye.

Çavkaniyên xwecihî bas ji vê yekê kirine ku 6 kes ji birîndarên wê bûyerê, bi sedema kûrahiya birînen xwe û nebaşbûna rewşa tenduristîya wan, bo nexweşxaneyên derdora bajarê Tîkabê hatine



veguhasîtin.

Ji aliyek din ve û her di vê rojê de, li rêya Kirmaşan bo Kamyaranê, bi sedema qezaya hatûçûna sê maşînan li curên Semend, Dêna û Barhelgîrekê, 5 kes canê xwe ji deşt dane û kesek jî birîndar bûye.

Berpîrsê Polîsê tirafîkiya parêzgeha Kirmaşanê ragihandiye, ew bûyere bi awayê rû bi rû bûye û 5 kes ji rêwîngên wan du maşînan canê xwe ji deşt dane û ajotvanê maşîna barhilgir jî birîndar û bo nexweşxaneyê hatiye veguhasîtin.

Di parêzgeha Urmiyê de xwediyê sêvan rastî pirsgirêkên micid hatine

Li sarxaneyên parêzgeha Urmiyê, zêdetir li 650 hezar ton sêvan bi kalîteya baş yên werzêran hene ku hekî neyêne firotinê dê werzêr rastî xisarên zêde a malî bibin.

Roja Duşemî 1ê Şibatê, Berpîrsê “Saziya Cehada Werzêrî” yê parêzgeha Urmiyê, “Resûl Celîlî” ragihandiye, ku 650 hezar ton sêvan bi kalîteya baş di sarxaneyên wê parêzgehê de hene û hekî bo derve neyêne şandinê dê xisar bibin”.

Sêvan werzêran heyamekî zêde ye ku di wan enbarên sarxaneyan de mane û hekî neyêne firotinê, di demeke kin de, dê ji nav herin û

xisarên malî yên giran bi werzêran û herwisa kesên xwediyê wan sêvan bikeve.

Rejîma Îranê bona şandina wan sêvan bp bazarên derveyê Îranê ti bernameyekî seraşt tinîne.

Wezareta “Pîşe, Kange û Ticaret” a rejîma Îranê ti hewleke micid bo firotina wan sêvan nedaye, herwisa bersiva daxwazên werzêran jî nadin.

Parêzgeha Urmiyê ku xwediyê 60 hezar hiktar baxçeyên sêvan e, îsal zêdetir li 1 milyon û 200 hezar ton sêvan berhem anîbûn ku li asta Îranê de pileya yekem e, lê



berhemên wan bi piranî li ser deştên wan werzêran mane û dem bi dem xisar dibin.

Kolberekî Kurd bi teqeya hêzên leşkerî li ser sînorê Baneyê canê xwe ji deşt da

Roja Duşemî 13ê Rêbendanê Kolberekî Kurd yê bi navê “Haşim Husênî” kurê Osman, xelkê gundê “Mencîlan” û rûniştîyê bajarê Baneyê bi sedema teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê li ser sînorê “Hengejalle” ya wî bajarî canê xwe ji deşt da.

Hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê, bi bê agehdarkirina berê teqe ji wî kolberî û hejmarek din ji kolberan kirin.

Haşim Husênî xîzandar e û bavê zarokê ye.



Dildarê helbestvan û welathezî û nîştimanperweriya wî



N: Keyhan Mihemedînjad

Ey reqîb maye qewmê Kurd ziman, naşikê û danayê bi topê zeman.

Helbestek ku ji aliyê “Yûnis Reûf” naskirî bi “Dildar” ve hate afirandin bû bi sirûda netewî ya netewa Kurd.

Bajarê Koye ku ser bi Başûrê Kurdistanê ye, nêzî 20 helbestvanên navdar têde hilkevîne. Ev bajar ê Hacî Qadir Koyî û Melay Gewre û Dildar e.

“Yûnis Reûf” naskirî bi “Dildar” helbestvanê welathezî û nîştimanperwer di bajarê Koyê de, li sala 1918’an hatiye dinê.

“Yûnis Reûf” an jî mamoşte “Dildar”, li sala 1927an diçe dibistanê û deşt bi dersxwandinê dike.

Sala 1941an di warê yasayî de bo zanîngeha Bexdayê derdiçe.

Sala 1945an xwendina xwe ya zanîngehê dawî pê tîne. Piştî sê salan û li rêketa 11’ê Kanûna Yekem a sala 1948an li Hewlêrê canê xwe ji deşt dide.

Belkî di gotarek wiha de mirov nekare bi başî Dildarê helbestvan binirxîne, lê emê hin bandorên wî li ser netewa Kurd û jiyana wî bi we xwenderên hêja re bas bikin.

Dildar xet û nivîseke ciwan hebûye, bilî zimanê Kurdî, zimanê Erebî, Tirkî, Farsî û Îngilîsî bi başî zaniye û heta qasekê jî zimanê Feransejî jî zaniye.

Ew di nivîsîna latînî de jî gelek şarezar bûye. Wî gelek

hez li stranên folklorî kiriye û nemaze lawîk û heyran gelek pê xweş bûye.

Mamoşte Dildar ne tenê bi heşt û sozeke nazik yan jî bi helbest, xeyalên xwe yê pir hêvî û nalebar pirsgerêkên Kurdan çareser dikirin, belkî wekî gelek xortên xebatkar hate nav meydana têkoşîna pir metirsî ya siyasî.

Pêka pertûka mamoşte “Ebdullxaliq Elaedîn” a bi navê “Dildar Şaîrî Şereşgerê Kurd”: Mamoşte Dildar di sala 1938an de tevî Partiya “Hîva” bûye û her bi sedema jêhatî û bi şiyانبûna wî, ew di heyameke kin de bû bi sekreterê vê Partiyê.

Wî hewil û zehmeteke zêde di pêxema pêşxistin û bihêzkirina wê Rêkxistinê de da. Piştî hin arîşeryan ku di sala 1944an de Partiya Hîva ji nav diçe, lê Dildar roj bi roj heştên wî bihêztir dibûn û her ew bûne sedem ku Dildar rêbazeke din a siyasî bigire berahîka xwe û li sala 1946an de tevî Partiya “Teheror” wate “Partiya Rizgarî” bû û ew di wê Partiyê de yek ji endamê bikêrhatî û xwedan hizir bû.

Ew di nav xelkê xwe de stêrkek ronahî bû. Ew hemû çalakiyên siyasî yê ku Dildar têde dijîya, bû bi sedemê vê ku bîr û hizra netewî li cem wî helbestvanê zêdetir geşe bike û roj li pey rojê heştên wî bo ax û nîştimanê zêdetir bin.

Dildarê helbestvan li derheq bîreveryên xwe û xwepêgihandina xwe li warê dîroka Kurdayetî de wiha nivîsiye: “Min bi heşteke hemasî ve di pirtûkxaneyê birayê xwe Seidî de deşt bi xwendinê kir, û min li pêş hemû tişteke de dîroka Feranse û Yûnan bi zimanê Tirkî xwand, piştê min her sê cildên pirtûka Îstîqbal a Celal Nûrî xwand û dîroka Kurd û Kurdistan a Emîn Zekî Beg û dîroka Baban û Soran û Mokriyanî ya Seyîd Husên Suznî bi Kurdî xwend. Wan pirtûkan silogên derbasbûyî anîne ber

çavên min û min digel xwe beravird dikir. Êdî min got ez hêdî hêdî mêjiyê xwe vekim û nirxandina dîrokê bikim”.

Dildarê helbestvan pêş ve ku biçe nav dinyaya helbestnivîsînê, bi xwe di vê derheqê de wiha nivîsiye: “Min dîwana Nalî gelek bi hûrî dixwand û helbestên ciwanên Nalî digel helbestên bi soz yê Hacî Qadir di nav mêjiyê min de li ser serweriya wêjeyê şer dikirin. Di vê şerê de tişteke bi min re hate bexşîn, gelek xeyalên wisa di mêjiyê min de hebûn ku min hez dikir di nav xelkê de bînime ziman, min xwe ceriband ku ez dikarim helbestan vehûnînim. Ez şevê heta direngê şevê nerazam û min karî qesîdeyeke 15 beytî bivehûnînim, min di nav helbesta xwe de li ser dayîkekê nivîsîbû ku bo xortê xwe yê hatî kuştin çawa digiriya! Eva yekem helbest bû ku min vehûnandîye, ma min his nebû? Yan jî genc nebûm? Belê min hem his hebû û hem jî ez genc bûm. Lê dema ku Nalî ez bo dildariyê radikêşandim û wê demê Hacî Qadir jî ez bo nîştimanperweriyê radikêşandim, wan du helbestvanan bi awayên cuda bandora xwe li ser dilê min hebûn. Lê xwendina dîrok û dilê min ê bi soz û his û xizmetkirina min, bo aliyê Hacî Qadir ve dibir. Her ku min dixwest xezeleke dildarî bêjim, dengê pîroz ê Hacî Qadir bi ser min de dihate qîrandin û digot:

“Basî zolfî dirêj û çavî bexew Nebirawe bûwe trî xesrewê”

Êdî ez neçar dibûm û min deştê xwe yê pênûs têde şil dikir û hizra xwe diguherî”.

Mamoşte Dildar gelek hêvî bi paşeroja netewa xwe hebû. Ew hertimî hêvîxwazê bextewerîya gel û azadiya nîştimana xwe bûye.

Dildar helbestvanekî hilkevî yê bilind û bi behre bû. Tişteke sereke û bingehîn ku bandordar bû li ser helbestên Dildar, dîmenên xweşik û

xemlîn yê Kurdistanê ku bi radeyekê heşt, soz û bîr di xeyalên wî de afirand, û wekî dildarekê germiya ciwaniya wî hejandiye.

An jî Dildarê helbestvan bi afirandina helbesta xwe ya bi navê “Ey Kurd”, basa bê dewletîya Kurd û paremayîya Kurdistanê dike û têde gotiyr hemû welat gihan bi serbixweyîya xwe lê her tenê tu mayî.

Helbesta Dildar a bi navê “Ey Reqîb” mînaka herî bilind a helbestên siyasî yê Dildarê helbestvan e.

Dildarê helbestvan herçiqas 30 sal jiya, lê wî karî cihê tiliyên xwe li ser tevgera dîroka helbestên hevçerx yê Kurdî bi cih bêhle û zêdetir bi helbestvanekî şoreşvanê Kurd bê nasîn.

“Ey Reqîb” ku wekî sirûda netewî di nav netewa Kurd de bi nav û bang e, bûye sembola netewî û ev hindeyê din Dildarê helbestvan mezintir kiriye.

Sirûda netewayetîya “Ey Reqîb” li serdemê Komara Kurdistanê de bû sirûda neteweyî û heta niha jî Ey Reqîb di her çar parçên Kurdistanê de sirûda neteweyî û nîştimaniya Kurd e. Ew sirûda, bas ji bûna Kurd dike, ji ber vê yekê bûye sirûda neteweyî.

Dildar di pileya yekem a jiyana xwe de serkevt, lê di pileya duyem de ecelê pêsêra wî girt û nehêla di pileya duyem a jiyana xwe de serkevtî be. Wî gelek hêvî digel xwe birin li jêr axê û wekî Hacî Qadir Koyî gotî: “Merg û jîn mîslî sêber û taw e – Evey baqî bimênê her nav e”.

Belê ya ku niha maye, nav û huner û welatparêziya navdarê Kurd mamoşte Dildar e.

Çavkanî: Pirtûka mamoşte “Ebdullxaliq Elaedîn” a bi navê “Dildar Şaîrî Şereşgerê Kurd”

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdiştanê de

Pêla binçavkirin û gazîkirina welatiyan li Rojhilatê Kurdiştanê gihîste 90 kasan zêdetir

Pêka raporek ku Ajansa Nûçegihaniya Mafê Mirov a “Kurdpa”yê belav kiriye, Ji rêkevta 17ê Befranbarê heta niha, pêlek ji binçavkirin û gazîkirina welatiyên Kurd li bajarên, Mihabad, Merîwan, Rebet, Sine, Bokan, Sewlava, Nexede, Pîranşehr, Seqiz, Kirmaşan û Tehranê ji aliyê hêzên ewlehî yê rejîma Îranê ve deşt pê kiriye ku hegera wê heye dîsan her berdewam be.

Pêka Amara Ajansa “Kurdpa”yê, rejîma dagîrker a Îranê heta niha 91 welatiyên Kurd yê Rojhilatê Kurdiştanê binçav kirine û 84 kes hatine binçavkirin û 7 kes piştî gazîkirinê bo îdarêya Îtîlaatê, lêkolîn digel wan hatiye kirin.

Amara tomarkirî a navenda amarî ya Ajansa Nûçegihaniya Mafê Mirovî a “Kurdpa”yê wiha ye:

Di wê navberê de, 84 kes hatine binçavkirin û 7 kes piştî gazîkirinê bo îdareya Îtîlaatê, lêkolîn digel wan hatiye kirin.

3 kes ji wan welatiyan yê bi navên: “Ferzad Samanî, Sûheyb Badrûc û Behmen Yûsifzade” xwendkar bûne”.

6 kes ji çalakvanên jîngeparêz jî ev in: “Dana Semedî, Kamran Mînyûyî, Zaniyar Muiitemedî, Sîrvan Kerîmzade û Karo Elîdad û Cemal Qasimî”.

12 kes ji çalakvanên medenî û ferhengî jî ev in: “Şepol Xizrî, Salar Rehewî, Deriya Talibanî, Efşîn Mamehmedî, Sîrvan Nûrî, Ferhad Mûsapûr, Fireydûn Mûsapûr, Soran Mihemedî, Esrîn Mihemedî û Soran Husênzade, Ereşto Melarehîmî û Mîstefa Îlxanîzade”.

5 jin yê bi navên “Nesrîn Yezdanîpûr, Nazenîn Etabek,

Melîhe Muradî, Semîra Ferhnekî û Îlham Yezdanîpûr”, bi tohmeta takbêjî li girûpa Mûzîkî ya jinên “Gilarîs” û beşdarî ji kilîpên piropagen-deyî”, hatine binçavkirin.

1 kes çalakvanê kedkariyê bûye (Efşîn Îlahî).

Hejmarek zêde ji welatiyên ku hatine binçavkirin welatiyên medenî û hejmarek zêde yê derçûyê zanîngehê bûne.

Hêzên ewlehî li dema binçavkirin û gazîkirina welatiyan bi vî awayê reftar digel wan kirine:

Hemû ew 91 kesane ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin û lêkolîn digel wan hatiye kirin.

Bi giştî 84 welatî bi bê hebûna ti belgeyên yasayî hatine binçavkirin.

81 kes ji wan welatiyên binçavkirî, piştî binçavkirinê digel nexuyabûna qedera nerohn rû bi rû ne û herwisa cihê ragirtina 75 kesane nexuya ye ku hejmarek ji welatiyên binçavkirî piştî çend rojan karîne digel malbata xwe peywendiya telefonî bigrin û ji veguhestina xwe bo girtîgeha ewlehî li bajarê Urmiyê û Sineyê, malbata xwe agehdar bikin.

34 haletên êriş, vekolîn û hilûşîna mal wate (şikandina derî û pencereyên malên wan), ji aliyê hêzên ewlehî ve rûdaye û herwisa hêzên ewlehî kereştayên kesî yê 6 welatiyan digel xwe birine.

Herwisa hêzên ewlehî, 9 kes di dema binçavkirinê de daneber lêdanê.

Nav û cihê binçavkirin û gazîkirina wan 91 kesane bi vî awayê ye:

Bajarê Mihabadê; 1-Derya Talibanî 2-Şepol Xizrî 3-Salar Rehewî 4-Efşîn Mamehmedî 5-Sîrvan Nûrî 6-Îman Ebdî 7-Ferzad Samanî (li bajarê Kerecê hatiye binçavki-

rin) 8-Hesen Ebdî 9-Soran Mihemedî 10-Soran Umerzade 11-Emîr Bayzîdîazer 12-Esrîn Mihemedî (li bajarê Tehranê hatiye binçavkirin) û Ereşto Melarehîmî.

Merîwan; 1-Dana Semedî 2-Zaniyar Muiitemedî 3-Karvan Mînyûyî 4-Sîrvan Kerîmzade 5-Cebar Pîrozî 6-Karo Elîdad (hatiye gazîkirin) 7-Sûheyb Badrûc (li bajarê Kerecê hatiye binçavkirin) 8-Adil Perwaze 9-Selman Edway 10-Şêrko Paahû, 11-Ferzad Mihemedî (di Tehranê de hatiye girtin), 12- Hevjîna Ferzad Mihemedî (di Tehranê de hatiye girtin), 13- Mensûr Welîpûr.

Sewlava; 1-Selman Edwayî 2-Siyamek Edwayî 3-Ekrem Edwayî 4-Ferdîn Edwayî. Ciwanro: 1- Seîd Qadirî Pawe: Seîd Xalidî Rebet; 1-Behmen Yûsifzade 2-Fireydûn Mûsapûr 3-Ferhad Mûsapûr.

Bokan; 1-Ezîme Nasirî 2-Husên Gerdişî 3-Elî Zûlfî 4-Qadir Resûlpûr 5-Mihemed Hacîresûlpûr 6-Husên Mêhrebân 7-Hêriş Resûlpûr 8-Fûad Mihemedpûr 9-Ferîba Ehmedî 10-Rojîn Mihemedpûr 11-Reşîd Ehmedî 12-Mihemedemîn Ehmedî 13-Riza Zendî 14-Mihemed Zendî 15-Ferhad Zendî 16-Mihyedîn Şame 17-Serdar Mihemedpûr 18-Hamid Resûlpûr 19-Eyûb Resûlpûr 20-Husên Resûlpûr 21-Îdrîs Hacîresûlpûr 22-Selah Hacîresûlpûr 23-Sîrvan Mihemedpûr, 24- Mîstefa Îlxanîzade

Sine; 1-Emîr Rizayî (hatiye gazîkirin) 2-Aman Muradiyan (hatiye gazîkirin) 3-Kamîl Nûrî (hatiye gazîkirin) 4-Aram Yûsifî 5-Ebdullah Asal 6-Cemîl Ehmediyan 7-Sîrvan Emînî.

Pîranşehr; 1-Resûl Lawaze 2-Kerîm Xelîfanî 3-Hisamedîn Xizrî 4-Şoreş Ehmedî 5-Piştîwan Nebîzergeten 6-Rehman Deryazî 7-Selam Xelîfanî.

Nexede; 1-Rehman Îbrahîmî 2-Diyako Zerteştî 3-Talib Reyhanî 4-Reşîd Reyhanî

Seqiz; 1-Eta (Şemal)Rehmanzade 2-Efşîn Îlahî 3-Babek Babayî.

Kirmaşan; 1-Nesrîn Yezdanîpûr 2-Nazenîn Etabek 3-Melîhe Muradî (hatiye gazîkirin) 4-Semîra Ferhnekî (hatiye gazîkirin) 5-Îlham Yezdanîpûr (hatiye gazîkirin).

Her di vî derheqê de;

Hêzên ewlehî givaş xistine ser malbata wan welatiyên ku hatin binçavkirin û bi wan re gotiye ku li civînkirin digel medyayan derheq rewşa zarokên xwe, xwe biparêzin.

Bi liberçavgirtina givaşa navendên ewlehî bo ser malbatên wan welatiyên ku hatine binçavkirin li derheq nedana zanyarî li derheq binçavkirin û rewşa wan, hegera wê heye ku hejmara welatiyên binçavkirî ji 91 kesane zêdetir be.

Malbatên hejmarek ji welatiyên binçavkirî tevî nigeranînîşandan derheq qedera endamên malbatên xwe, bas ji bersivnedana navendên ewlehî û dezgeha qezayî derheq sedema binçavkirin û cihê ragirtina wan welatiyan dikin.

Herwisa dadsitanê wan bajarane bi malbata hejmarek ji welatiyên binçavkirî ku li hewla girtina parêzer bûne, ragihandiye ku heta bi dawîhatina heyama lêkolînê, hegera hatina parêzer bo navdosiya wan welatiyane nîne”.

Ew core binçavkirine ya bi kom û serberedayî, serkuta sistematîkî ya çalakvanan li Kurdiştanê, agehdarnebûn ji qedera wan û bin lêkolîn û eş û îşkenceya navendên ewlehî bo wergirtina îtirafa bizorê, dibe bi awayekî micid bê şermzarkirin û ji aliyê navendên navnetewî yê mafê mirov ve bê genceşekirin.

Agirî

◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdiştanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat:

AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (391)

Wêneyên merasima 2`ê Rêbendanê li çiyayên Kurdistanê

